# MUZÎK

## SERETAYÎ

## 5

2019/2020

## AMADEKAR

**Ev pirtûk ji aliyê Komîteya Muzîkê ve hatiye amadekirin.**

## LÊVEGER

- **Komîteya Şopandinê**
- **Komîteya Fotoşopê**
- **Komîteya Redekteyê**

**Ev pirtûk ji aliyê Saziya Minhacan ve, wek pirtûka wanedayînê, ji bo dibistanan hatiye pejirandin.**

# NAVEROK


**LÊVEGER** ------------------------------------------------------------ 7

**PÊLEKANA MUZÎKÎ**------------------------------------------------- 11

**XWENDINA NOTEYA MUZÎKÎ**-------------------------------- 12

**EY REQÎB** -------------------------------------------------------- 14

**DILDAR** ----------------------------------------------------------- 15

**MIHEMED ŞÊXO** ------------------------------------------------ 16

**STRANA BER DILÊ MIN PIR ŞÊRÎN E**---------------------- 18

**BIZIQ** ------------------------------------------------------------ 20

**PILEYA BIDIRAN**----------------------------------------------- 22

**RAHÊNANA RITIMÎ** ------------------------------------------ 23

**OKORDIYON-ACCORDION**----------------------------------- 24

**HOZAN SERHED**------------------------------------------------ 25

**STRANA AX KURDISTAN** ----------------------------------- 27

**AGAHÎ**----------------------------------------------------------- 28

**STRANA BEJNOKÊ** ------------------------------------------ 29

**PILEYA DUDIRAN** ------------------------------------------- 30

**RAHÊNANA RITIMÎ** ------------------------------------------ 31

**LÊDANÊN RITIMÎ**--------------------------------------------- 32

**TABLOYA RITIMÎ**--------------------------------------------- 33

**NÎŞANÊN GUHARTINÊ** --------------------------------------- 34

**STRANA BÊLIM LO**--------------------------------------------- 36

**IKSÎLÎFON** ---------------------------------------------------- 37

**SONATA** ---------------------------------------------------------------- 38

**RAHÊNANÊN PÊKHATÎ**------------------------------------------------- 40

**KEMAN** ------------------------------------------------------------------ 41

**HER DU TEŞEYÊN RITIMÎ**--------------------------------------- 43


**EYŞE ŞAN** ------------------------------------------------------------ 45

**STRANA BI ÇI YE** -------------------------------------------------- 47

Wane 1

# LÊVEGER

## 1. DEMÊN MUZÎKÎ




## 2. PILEYÊN MUZÎKÎ Û TEŞEYÊN WAN

❖ Em bi bîr bînin ku pileyên muzîkî, **7** pile ne:

Do – Rê – Mî – Fa – Sol – La – Sî



### Teşeyên pileyên muzîkî:

Nîşaneya pileya yekpar 


Nîşaneya pileya spî 

Nîşaneya pileya reş 


a. **Pileya yekpar:** Mezintirîn pileya muzîkî ye û di çar deman de û bilêvkirin "Ta"`yê tê xwendin.



b. **Pileya spî:** Piştî yekparê, duyemîn pileya muzîkî ye û di du deman de û bilêvkirina "Ta"`yê tê xwendin.



c. **Pileya reş:** Sêyemîn pile ye û di demekê de û bilêvkirina "Ta"`yê tê xwendin.



## 3. PILEYÊN XALDAR

❖ Yekpara xaldar:

o. = 6 dem

❖ Dupara xaldar (pileya spî ya xaldar):

 = 3 dem

❖ Çarpara xaldar (pileya reş a xaldar):

 = 1.5 dem


**Têbînî:**

❖Her xalek, nîv pileyê ji pileya li paş xwe dixwaze.

❖Xal, her gav li aliyê rastê yê pileyê, tê nivîsîn.



**6 = 2 + 2 + 2**



**3 = 2 + 1**



**3 = 1 + 1 + 1**




**1.5 = 0.5 + 0.5 + 0.5**

Wane 2

# PÊLEKANA MUZÎKÎ

- Dengên muzîkî, li ser pênc rastekên beramber û çar valahiyên wekehev, tên nivîsîn. Ji vê re **"pêlekana muzîkî"** tê gotin.



**Têbînî:** Rastek û valahî, ji jêr ber bi jor ve, tên jimartin.

**Kilîlk:** Nîşaneke ku li destpêka pêlekanê tê danîn. Kilîlk, ji bo diyarkirina dirêjahiya qata dengekî, weke navê wê rastekê tê bikaranîn.

- Di nivîsîna muzîkî de, sê cureyên kilîlan tên bikaranîn:







Kilîlka Sol Kilîlka Fa Kilîlka Do

- Têbînî: Kilîlka sol a herî pir tê bikaranîn. Fa û Do jî pir nayên bikaranîn û kêm caran di hin noteyên biyanî de, bi kar tên.

# XWENDINA NOTEYA MUZÎKÎ

- **Ji bo xwendineke durist, divê ev xalên li jêr, li ber çavan bên girtin:**

1. Zanîna şêweya nîşanên demê.
2. Zanîna nirxê demê yê her şêweyê û xwendina ritima wê.
3. Li ser pêlekana muzîkî nasîna dengên muzîkî û cihên wan, li gorî kilîlka ku ji bo wê hatiye danîn.
4. Diyarkirina yekeya demê ya destpêka awazê, li gorî pîvana xaneya ku ji bo wê hatiye danîn.

# STRANA BILBILO SEYRANIYO

Gotin û note: Li gorî waneyên bûrî, em bi hev re, vê stranê bi awayekî ritimî û li gorî noteya muzîkî, bistrên:




Hey bilo bilo bilo
Bilbilo seyraniyo
Çavreş tijî kilo
Min xwaro ji eşq û dilo
Te yarek miqabilo
Ez û bilbilê lalim
Şev û rojan dinalim
Aşqê bejna şepal im

Hey bilo bilo bilo
Ez û bilbilê dîn im
Şev û rojan dixwînim
Aşiqê bejna xatûn im
Ez û bilbilê ker im
Hey bilo bilo bilo

Gelêrî

Wane 4

# EY REQÎB



Ey reqîb her, maye qewmê kurdziman
Naşikê û danayê bi topê zeman
Kes nebê kurd dimirin, kurd jîn dibin
Jîn dibin qet nakevî ala kurdan

Em xortên, rengê sor û şoreş in
Seyr dike xwîna diyan me darijand
"Dîsgotin"

Em xortên, Midya û Keyxusrew in
Dîn îman û ayîman, her niştiman
"Dîsgotin"

Lawê kurd e, bûye ser pê wek şêran
Da bi xwîn neqşîn bike, tacê cîhan
"Dîsgotin"

Xortê nuh tev hazir û amade ne
Canfîda ne canfîda, her canfîda
"Dîsgotin"

Yûnis Reûf-Dildar

# DILDAR



Navê wî yê rast, Yûnis Reûf kurê Hedîmê Sicadî ye. Di nava gelê kurd de, bi nasnavê **"Dildar"** tê nasîn. Di **20.02.1918**`an de, li Koysenceqê, ji dayîk bûye. Xwendina xwe, li Koy û Kerkûkê bi dawî kiriye. Piştî wê, li zanîngeha Bexdayê xwendiye û bûye parêzer. Dildar, hozanvanekî rewşenbîr û şoreşger bû. Di avakirina Komara Mehabadê de, cih girtiye.

Di temenê xwe yê **30** salî de, ji ber krîza dil, jiyana xwe ji dest daye. Di sala **1946**`an de, sirûda wî ya navdar **"Ey reqîb"** bûye merşa netewî ya Komara Mehabadê.

Di **12.10.1948**`an de, koça dawî kiriye.

# MIHEMED ŞÊXO



Navê wî yê resen, Mihemed Salih Şêxmûs e. Hunermendekî kurd ê rojavayê Kurdistanê ye. Li gundê Agûlê yê girêdayî bajarê Qamişloyê di sala **1948**`an de ji dayîk bûye. Yek ji navdartirîn stranbêjên netewyî ye. Li ber destê Hesenê Tofo û Xelîlê Zêdî fêrî muzîkê bûye.

Li gundê Xecokê dibistana seretayî xwendiye û li Qamişloyê jî ya navîn xwendiye. Ji ber ku di wê demê de, zimanê kurdî qedexe bû, bi dizî fêrî wêjeya kurdî bûye û xwendiye. Ji ber nexweşiya çavên xwe, xwendina xwe berdewam nekiriye û ji ber rewşa aborî nikarîbû xwe derman bike. Di encama de, ji bo ku karibe malbata xwe jî xwedî bike, vedigere gundê xwe û di cotkarî û çandiniyê de, kar dike.

Li her çar perçeyên Kurdistanê geriyaye. Her wiha çûye Beyrûtê jî û bûye endamê Yekîtiya Hunermendên Libnanê. Bi hunermendên mîna Wedî Esafî, Feyrûz û Semîra Tewfîq re têkildar bû û bi zimanê erebî jî stran gotine.

Di **09.03.1989**`an de, ji ber nexweşiyê jiyana xwe ji dest daye û li goristana Hilêliyê ya ku li rojavayê bajarê Qamişloyê ye, spartine axê.

Hin stranên wî:

1. Nesrîn
2. Ay felek
3. Hebs û zindan
4. Ay lê gulê
5. Gewrê
6. Azade şêrîn
7. Ber dilê min pir şêrîn e

# STRANA BER DILÊ MIN PIR ŞÊRÎN E

Ber dilê min pir şêrîn e
Wek kulîlka bihilm û bîn e
Dilê min bo wê bievîn e
Bê te min gazî û qêrîn e

Derdê te weke Xabûr e
Bêbinî û kûr û dûr e
Pêlin gir in ê din hûr in
Li min xistin birîn dûr in
Çi Xabûrek bêdevî
Wek geliyê dudevî

Tu ji mir bûye derd û keder
Tu car ji bala min nayê der
Wej' evîna te nakim der
Tu ji mir' bûye kul û keser
Hela were şêrînê
Derman bike vê birînê

Piştî her du çavên belek
Min heznekir hîna kesek
Belkî vegerî li me felek
Her du dila dîsa bi yek
Miradê me bi cî werê
Êşa dila pê derê

Kengî li me bê dem û dewran
Vegerê li me, rojê ciwan
Bê me cejna her du dilan
Bê me bîna gul û baxan
Miradê me bi cî werê
Êşa dila pê derê

Stran: Mihemed Şêxo


# BIZIQ

Biziq, amûreke têlî ye ku gelek awaz li ser wê tên lêdan. Bi teşeya xwe, mîna ûdê ye, lê ew xwedî darekî dirêj e û gewdeyekî ji yê ûdê biçûktir e.

Hejmara têlên wê di navbera (**4 - 6**) de ye, lê ji welatekî heta welatekî din, ji hev cuda dibe.

Peyva biziq, peyveke nûjen e, di sedsala **20**`an de, derketiye holê û ji peyva yûnanî **"Bozoko"** hatiye dariştin. Gelê kurd di dîlan û şahiyên xwe de, wê alavê gelekî bi kar tîne.

Teşeya biziqê ji teşeya tenbûrê hatiye girtin. Gelek hunermendên kurd ên bi nav û deng, di lêdana wê alavê de, pir şareza û pispor in. Mînak: Se'îd Yûsiv. Se'îd Gabarî...


Kilîlk
Zend
Kod
Kuna deng
Têl

Wane 9

# PILEYA BIDIRAN

Biçûktirîn pileya muzîkî ye ku her pileyeke bidiran, yeksanî nîv dema muzîkî ye. Ev jî tê wateya ku her pileyeke reş yeksanî du pileyên bidiran in.

Mînak:



Bi awayekî ritimî û bi bilêvkirina "Ta Tî" tê bilêvkirin.

Nîşaneya bêdengiya pileya bidiran: Tê wateya rawestandina bêdengiya bi qasî nîv demê ye.




Wane 10

# RAHÊNANA RITIMÎ

Bi hevalên xwe re, ez ê vê rahênanê bi alavê heyî, bi awayekî ritimî, pêk bînim:







Bi rawestandina li cem nîşaneyên bêdengiyê, her carê xwendearek, rahênanên bûrî bistrê.



# OKORDIYON-ACCORDION



Okordiyon: Alaveke muzîkî ya bayî ye. Bi rêya gerana ba di hindurê wê de, deng derdikeve.

Di sala **1822**`yan de, Christian Friedrich Ludwig Buschmann (Kirîstiyan Frîdrîç Lodvîg Boşman) amûra okordiyonê afirandiye.

Okordiyon, ji pimpimokeke (nepox) ku ji çerm hatiye çêkirin û kilîtên reş û spî ji bo destê rastê yê sazvan, mîna kilîlkên piyanoyê hatiye amadekirin. Li aliyê çepê ji hin pişkokên ku hevsengiyê di navbera awaz û deng de pêk tînin, hatiye çêkirin.

Okordiyon, di dema sazê de, bi rêya du qayîşên çermî, li milê kesê/a sazvan, tê girêdan.

# HOZAN SERHED



Hozan Serhed: Hunermendekî bi nav û deng e bû; şehîdê têkoşîna azadiyê ye. Navê wî yê rast, Silêman Alpdoxan e.

Hozan Serhed, di **24**`ê tîrmeha **1970**`yî de li bakurê Kurdistanê li navçeya Zêdkan a bajarê Agiriyê ji dayîk bûye. Hozan Serhed, biçûkê xwişk û birayên xwe bû. Di heft saliya xwe de, fêrî lêdana tembûrê dibe. Di salên (**1985-1986**) de, kasêta xwe ya yekem der tîne. Di sala **1988**`an de, li Zanîngeha Egeyê ya Tirkiyeyê dest bi xwendina zanîngehê dike.

Li Ewropayê, di nava Koma Berxwedan de, xebitiye. Di sala **1996**`an de, vedigere welat û tevlî navenda Çanda Mezopotamyayê ya Hewlêrê dibe û beşdarî çalakî û şahiyên şoreşê û civakê dibe. Paşê diçe bakurê Kurdistanê. Di tîrmeha **1999**`an de, li çiyayê bakurê

Kurdistanê û di encama şerekî giran de, tevlî karwanên şehîdan dibe.

Hozan Serhed, yek ji pêşengên muzîka şoreşgerî û muzîka nûjen e. Li Ewropa, başûrê Kurdistanê û li çiyayan, hem ji bo muzîka kurdî û hem jî ji bo karên giştî yên şoreşê, xebatek jidil dikir.

Mirovekî dilgerm, afirînerê muzîkê û pisporê tembûrê bû. Gelek ciwanên kurd, niha şopdar û şagirtên wî ne.

## Hin stranên wî:

1. Payîz e
2. Ez Kurdistan im
3. Hewlêr
4. Ser Banîka
5. Mizgîna Leheng
6. Şêr e Şêr e
7. Çûka Ser Darê
8. Sîpanê Xelatê
9. Dayê Dayê
10. Dengê Zerdeşt

Wane 13

# STRANA AX KURDISTAN

Kurdistan deşt û şaxên te rengîn in
Baxên gulan
Kurdistan kal û bavên te zengîn in
Kaniyên zêran
Kurdistan ceng û barên te şêrîn in
Avên çiyan
Ax kurdistan ax Kurdistan

Niştiman karkerên te raperîn e
We qehreman
Niştiman keç û xortên te gihane
Şêrên çiyan
Niştiman zarokên te tev şiyar bûn
Bûn şoreşvan bûn şoreşvan
Ax niştiman ax niştiman

Kurdistan newêrê ser te rabû
Mij û boran
Kurdistan sîng û berê te xuya bû
Bax û bostan
Kurdistan nav û dengê te belav bû
Nava gihan
Ax Kurdistan ax Kurdistan

Stran: Hozan Serhed

# AGAHÎ

## 1. Operetta (Operêta):

Şanoyeke muzîkî ya demkurt e. Di stran û muzîka xwe de, bi sivikbûn û hêsaniyê tê nasîn. Hin caran, di nava rolên wê yên muzîkî de, beşên bêawaz, derbas dibin. Ew jî bi rêya tevgeran, tên derbirîn û stran.

**Mînak:** Opereta **"Orfîs di cîhana jêrîn de"** ya danerê Fransiz Jacques Offenbach (Cak Ofinbak) e.

## 2. Koncerto (Konçêrto):

Danîna muzîkî ya alavî ye. Piraniya caran ji bo amûreke muzîkî ya tenê, tê bikaranîn, lê dibe ku ji du, sê, çar amûrên orkestrayê re jî bê danîn.

**Mînak:** Konçêrta piyanoyê ya Johannes Brahms (Johan Brams).

Wane 15

# STRANA BEJNOKÊ

❖ Em û mamosteyê/a xwe bi hev re, noteya vê stranê bi ritimî û awazî bistrên:




Bejnokê bejnokê
Mala bavê bejnokê
Bejnokê bejnokê
Şêrînê şemamokê

Dosta min biçûk e
Mala bavê bejnokê
Dosta min biçûk e
Şêrînê şemamokê

Ser gerdenê zêr e
Bejnoka Emer e
Gerden zêrê zer e
Dosta min esmer e


Gelêrî

Wane 16

# PILEYA DUDIRAN


❖ Ew di asta duyem de, li pişt pileya bidiran tê. Her pileyeke dudiran, yeksanî çariyeke demê ye.

Bi awayekî ritimî û bilêvkirina **(Ta Fa Tî Fî)** tê bilêvkirin.



1. Di ritimên bilez de, tê bikaranîn.
2. Dema wê, bi çariyeke demî ( $\frac{1}{4}$ ) tê nîşankirin.
3. Li gel rawesteka pileya dudran (  ), ji pileyê re jî heman dema bêdengiyê ya ku bi çariyeke demî tê nîşankirin, heye.


❖ Bi awayekî ritimî em vê rahênanê bixwînin û teşeya pileya dudiran, nas bikin:



# RAHÊNANA RITIMÎ



❖ Bi hevalên xwe re komekê çêkin û bi hev re, li gorî alavên heyî, van ritiman, lê bidin:



Wane 18

# LÊDANÊN RITIMÎ

Lêdana ritimî (Dum û Tak), di xaneyekê de, bihêzbûn û lewazbûnê, diyar dike.

Lêdanên ritimî, bi van sembolan tên nîşandan:

1. (DUM) a dirêj 

   (DUM) a kin 

**Dûvikê sembolê, li jor e.**

2. (TAK) a dirêj 

   (TAK) a kin 

**Dûvikê sembolê li jêr e.**


3. (ÊS) a dirêj 

   (ÊS) a kin 

- ❖ **DUM:** Di riitmê de, tê wateya lêdana bihêz (xurt).
- ❖ **TAK:** Di ritimê de, tê wateya lêdana nîvxurt.
- ❖ **ÊS:** Di ritimê de, tê wateya lêdana lawaz.

Wane 19

# TABLOYA RITIMÎ

| YEKEYA DEMÊ | BILÊVKIRINA WÊ |
|---|---|
|  | Ta' a' a' a |
|  | Ta' a |
|  | Ta |
|  | Ês |
|  | Ta tî |
|  | Ês tî |
|  | Tî ês |
|  | Ta Fa Tî Fî |

# NÎŞANÊN GUHARTINÊ

Nîşanên guhertinê, li aliyê çepê yên dengê muzîkî tên danîn. Ew dibin sedema bilindkirin an nizimkirina wan dengan.

- Nîşana bilindok (diyez) ♯
- Nîşana nizimok (bemol) ♭
- Nîşana rastok (beccare) ♮

**1-** Nîşana bilindok (diyez) ♯ **:** Deng, nîv pileyê bilind dike.


**2-** Nîşana nizimok (bîmol) ♭ **:** Deng, nîv pileyê nizim dike.

**3-** Nîşana rastok (bîkar) ♮ **:** Deng, vedigerîne ser awayê xwe yê xwezayî.

**Nîşanên guhertinê bi du awayan tên:**

1. **Nîşanên sereke:** Rasterast li paş kilîlkê tên danîn. Ew bandorê li qata dengê hemû perçeyên muzîkî, dike.

Mînak:




2. **Nîşanên rastok:** Tenê bandorê li wê qata dengan dike ku li kêleka çepê, ya pileyan tê danîn.


Mînak:



Wane 21

# STRANA BÊLIM LO

❖ Li gorî waneyên ku me li ser noteyê û hin nîşaneyên wê standine, em û mamoste bi hev re, vê stranê bistrên:




Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo

Em ê îşev li ku bin bêlim lo
Em ê sibe li ku bin zalim lo
Li ser Pira Batmanê bêlim lo
Li ser Pira Batmanê zalim lo
Xweş tê dengê erbanê bêlim lo
Xweş tê dengê erbanê zalim lo
Li reşmoriyê geriyam bêlim lo
Li reşmoriyê geriyam zalim lo
Wa ye di stûyê Eyşanê bêlim lo

Her bêlim, bêlim, bêlim, bêlim lo
Her bêlim, bêlim, bêlim, zalim lo

Gelêrî

Wane 22

# IKSÎLÎFON



Iksîlîfon (Xylophone): Peyveke yûnanî ye ji du peyvan pêk tê; xylon (Iksîlo) a ku tê wateya **"dar"** û phone (Fon) ya ku tê wateya **"deng"** hatiye dariştin. Bi vî awayî, tê wateya **"dengê daran"**.

Amûreke muzîkî ya ritimî ye. Di nava beşên amûrên ku tên lêdan de, cih digir. Ji komeke darên bi dirêjahiya xwe ji hev cuda ne, pêk tê. Ji perçeyê kin ber bi yê dirêj ve, li ser hilênerekî tên girêdan û bi rêya du çakûçên biçûk, tê lêdan.

Awayê wê yê nûjen ji kanzayên sivik tê çêkirin. Mirov bi hêsanî fêrî lêdana wê dibe.

# SONATA



Sonata: Ji peyva îtalî **sonare (**sonar**)** a ku tê wateya derketina deng ji amûreke muzîkî. Ew li beramberî peyva **cantata (**kontata**)** ya ku tê wateya strana bi dengê mirovan. Ew jî ji peyva latînî **contar (**kontar**)** hatiye dariştin.

Sonata: Perçeyeke muzîkî ye. Di bingeha xwe de, ji piyano re, tê nivîsandin. Her wiha dibe ku ji du amûran re jî bê nivîsandin, lê helbet, dê piyano yek ji wan be.

**Mînak:** Sonatên piyano û kemanê, Sonatên piyano û filûtê, an jî sonatên piyano û çêloyê.



Bîthovên

Di sonatayê de, piyano ya sereke ye; ji ber  ku ew amûra tekane ye ku dikare hemû awazan, lê bide.

Ji çar tevgeran pêk tê, ew jî ev in:

1. Tevgera yekem a bilez "allegro"
2. Tevgera duyem a hêdî "andante"
3. Tevgera sêyem a navîn "moderato"
4. Tevgera çarem a bilez "allegro"

**Mînak:** Sonata ya "Ronahiya Heyvê" ya **Ludwig van Beethoven (**Bîthovên**)**.


Di vir de, divê ku em cudahiya di navbera sonata ku ji orkêstrayê re bi giştî tê nivîsîn û ya perçeyekî muzîkî ku bi taybet ji piyanoyê re, tê nivîsîn, nas bikin.

- ❖ Piştî Bîthovên, tu guhartinên giştî di sonatayê de, çênebûne.


Wane 24

# RAHÊNANÊN PÊKHATÎ

❖ Her pileyeke reş lêdanekê tenê dibe û her xaneyek, du pileyên reş di nava xwe de dihewîne:





❖ Her pileyeke spî du lêdanan dibe û her xaneyek, pileyeke spî di nava xwe de dihewîne, di ritimê de bi lez neke:



# KEMAN

Amûreke muzîkî ya têlî ye û di nava wan de, ya herî navdar e. Xwedî 4 têlan e û bi rêya kevanê, tê lêdan.

Di muzîka klasîk de, hatiye bikaranîn û dengê wê wekî dengê herî nazik, hatiye nasîn.



1. Koda deng: Kodeke darîn e, erka wê bilindkirina deng e û parçeyê kemanê yê herî mezin e.
2. Kilîlk: Ji **4** kilîlkan pêk tê. Erkê wan, hevsengiya dirêjî û kinbûn têlan in.
3. Zend: Perçeyê darîn ê ku têlan hildigire.
4. Têl: Hejmara wan 4 in, piraniya wan ji tevlihevkirina hin kanzayan (elemînyûm, hesin û zêr) tên çêkirin.
5. Kunên dengdêr: Du kun in, di teşeya xwe de, mîna tîpa "f" ya fransî ne û bi rêya wan, deng derdikeve.
6. Şeh: Ew perçeyê ku têl bi wê ve tên girêdan.
7. Kevan: Ji dar tê çêkirin, lê têla wî, ji mûyê teriya hespan tê çêkirin.



Wane 26

# HER DU TEŞEYÊN RITIMÎ



- Em bi awayekî ritimî van teşeyan bi lêv bikin.
- Bi çepikan re, em teşeyên ritimî bistrên.



Ta'a'a'a



Ta'a



Ta



Ta tî



Ta fa Tî fî

- Em bi hev re, vê teşeya nû bi awayekî ritimî, bi lêv bikin:



Ta Tî Fî

❖ Em bi hev re, vê rahênana solfayî, bixwînin û bistrên:



# EYŞE ŞAN



Eyşe Şan, Stranbêjeke navdar a kurd e. Di sala **1938**`an de, li Amedê ji dayîk bûye û di sala **1996**`an de, li Izmîrê koça dawî kiriye.

Di **20** saliya xwe de, stranên klasîkî yên kurdan, di derbarê jinan de, dibêje.

Ji ber gotina stranên kurdî, bi zextên mezin re, rû bi rû dimîne û ji neçarî di sala **1972**`yan de, weke penaber diçe Almanyayê.

Di sala **1979**`an de, demekê di Radyoya Bexdayê de dixebite û gelek berheman diafirîne.

Hin stranên wê:

1. Dayikê
2. Yan mirin yan Diyarbekir

3. Qederê
4. Zimanê kurdî zimanê me ye
5. Xanimê lê lê
6. Ez xezal im
7. Ay dil
8. Kirasê te meles e
9. Were keçê nav zebeşan

Wane 28

# STRANA BI ÇI YE




Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê Çolyanê bi çi ye
Çemê Çolyanê bi daro
Lê çeyran berx û karo
Çavreş keçka muxtaro

Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê Çolyanê bi çi ye
Çemê Çolyanê bi gezo
Lê çeyran berx û pezo
Çavreş keça çerkezo

Ha bi çi ye çi ye çi ye
Çemê Çolyanê bi çi ye
Çemê Çolyanê bi bî ye
Lê çeyran berx û mî ye
Çavreş keçka miftî ye

Gelêrî

# BELAVKIRINA WANEYAN LI SER SALA XWENDINÊ

| Heftî / Meh | Heftiya Yekem | Heftiya Duyem | Heftiya Sêyem | Heftiya Çarem |
|---|---|---|---|---|
| Rezber | | | Lêveger | Pêlekena Muzîkî |
| Cotmeh | Xwendina Noteya Muzîkî | Ey Reqîb | Dildar | Mihemed Şêxo |
| Mijdar | Strana Ber Dilê Min Şêrîn e | Biziq | Pileya Bidiran | Rahênana Ritimî |
| Berfanbar | Okordiyon | Hozan Serhed | Strana Ax Kurdistan | Agahî |
| Rêbendan | Lêveger | Nirxandin | Bêhnvedan | Bêhnvedan |
| Reşemeh | Strana Bejnokê | Pileya Dudiran | Pileya Dudiran | Rahênana Ritimî |
| Avdar | Lêdanên Ritimî , Tabloya Ritimî | Nîşanên Guhertinê | Strana Bêlim Lo | Sonata |
| Cotan | Rahênanên Pêkhatî , Keman | Her Du Teşeyên Ritimî | Her Du Teşeyên Ritimî | Eyşe Şan , Strana Bi Çi Ye |
| Gulan | Lêveger | Nirxandin | | |